Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar :1060 | 30-Nisan- 2023 | www.ronahi.net/ku/

Navnîşan
www.ronahi.net/ku/
nameronahi@gmail.com
423165

# Nivîsandina bi temamî fonetîk a 4400 salî ya Padîşahiya Elamê

**Lînear nivîseke pir taybet a Padîşahiya Elamê ye ku dikeve başûrê rojavayê Îranê ya îroyî, ji hêla lêkolînerek Fransî û ekîba wî ve hate deşîfrekirin.**



Ev destnivîsa Padîşahiya Elamê xwe dispêre 4400 sal. Nivîs berî demeke kin hat deşîfrekirin. Destnivîsa elamî ku derbasî dîroka nivîsandinê bûye, zêdetirî sedsalekê nehate deşîfrekirin. Cara dawîn di sala 1950'î de nivîsek kevn hate deşîfrekirin. Ew wekî Linear B, formek Yewnanî ya kevnar jî tê zanîn.

Di sala 1903'an de li bajarê Sûsayê di kolandinan de tîpên Elamî hatin dîtin, lê di wê demê de kesî ji van nivîsên geometrîk fêm nedikir. Sûsa îro li Huzistan e. Paytextê Padîşahiya Êlamê bû. Sûsa ku navê wê bi Kurdî û Farsî "Şuş" e, li deşteke bi qasî 140 kîlometreyan li rojhilatê çemê Dîcle ye.

François Desset, ji laboratûara navenda lêkolînê ya Fransî CNRS, ji sala 2006'an vir ve nivîsên li ser vazoyên zîvîn lêkolîn kir û encax di sala 2017'an de karîbû bi ekîba xwe re çareser bike. Lêkolînerê ku fêm kir nivîsa vê ziman çawa rave dibe, karîbû ji sedî 96'ê sembolên vê nivîsa bêhempa deşîfre bike.

Dema ku lêkolînerê Fransî rastî vê destnivîsa hezarsala sêyemîn a beriya serdema me hatiye, dibêje ku ew ji aliyê fonetîka wê ya bêhempa matmayî maye. Wî bi zelalî çar pergalên nivîsandinê yên ku di wê demê de li cîhanê hebûn dizanibû: Hîeroglîf, nivîsê bizmarî û Elamî û tîpên Îndûs ku li Pakistan û Hindistanê îro jî nehatine deşîfrekirin.

Deset tîne ziman: "Di encama deşîfrekirinê de, berevajî ya ku ez difikirîm, diviya bû ku ez bi wê fikrê bihatama ku ev pergal tenê fonetîk e û ew di hemû teoriyên têkildarê beridîna nivîsandinê de guhertinek mezin e."

Deset bi kurtî wiha dibêje: "Ew rêza pênc dengdêran (a, ê, î, o, û) û dozdeh dengdar in. Ji hevgirtina dengdêr û dengdaran 60 tîp têne wergirtin. Pergala nivîsandinê bi 77 îşaretan dixebite. Ji ber vê yekê ew ji hêla fonetîk ve pir hesas û pergalek aborî ye."

Profesora Lêkolînên Mezopotamyayê li Zanîngeha Cenevreyê Catherîne Mîtermayer piştrast dike ku deşîfrekirina Kevirê Elamê Lînear vedîtinek pir girîng e ji bo herêmê.

Mîttermayer dibêje, "Ne tenê ji bo Qraliyetê Elamê, ji bo Mezopotamyayê jî ev yek girîng e. Dîroka vê padîşahiyê beriya her tiştî ji çavkaniyên ku bi Sumerî an jî Akadî hatine nivîsandin tê zanîn. Bi rastî nivîseke ku tenê ji nava vê çandê padîşahiyê ye agahiyan dide me. Ev yek gelek tişt li têgihiştin û dîroka wê zêde dike."

Padîşahiya Elamê li derdora Xûzistan û eyaleta Farsê ya îroyîn desthilatdar bû. Gelek aliyên padîşahiyê hîn jî nehatine kifşkirin. Mînak rêxistina wê ya siyasî, xebatên hilberînê û mîtolojiya wê nayê zanîn.

Gelek çavkaniyên Kurdan diyar dikin ku Elam jî yek ji wan padîşahiyên Kurdan e ku hêj ji aliyê dîroka fermî û piraniya lêkolîneran ve nehatiye dîtin.




# Bi dengê xwe yê zîz xwezaya welatê xwe nîşan dide

**Malbatê behreya wî keşf kir û bapîrê wî ew teşwîq kir. Zarokê bi navê Şêrzad Reşîd xwedî dengekî zîz e. Stranên zarokan dibêje. Li gel perwerdeya xwe ya dibistanê perwerdeya muzîkê jî dibîne da ku behreya xwe bi pêş bixe.**



Şêrzad Reşîd (12) ji gundê Hesn Dêra yê navçeya Bilbilê ya kantona Efrînê ye. Ji dema ji Efrînê koçber bûye, tevî malbata xwe li taxa Şêxmeqsûd a Helebê dimîne. Şêrzad ji xwişka xwe ya mezin fêrî stranbêjiyê bû. Malbatê jî ew teşwîq kir ku behreya xwe bi pêş bixe.

Tevî ku li ser dikê stran negotine û li tu peymangehên muzîkê perwerde nedîtiye, lê di stranbêjiyê de serkeftî ye.



Bapîrê Şêrzad, herî zêde ew teşwîqî kir ku behreya xwe bi pêş bixe. Malbatê rê dayê ku li Navenda Çand û Hunerê ya Mihemed Şêxo perwerdeya xwe bibîne û behreya xwe bi pêş bixe.

Ji bo ku Şêrzad ji xwendina xwe qut nebe, hefteyê rojekê perwerde dibe. Têkildarî vê Şêrzad got: "Mamoste û dostên min ên dibistanê ji dengê min hez dikin."

Şêrzad di şahiyan de jî stranan dibêje. Herî zêde strana 'Gul' li ber dilê wî xweş e. Derbarê vê de dibêje: "Welatê me tijî gul in. Efrîn û bi xweza û gulên xwe navdar e. Stranên din jî armancdar in."

Piştî ku di şahiyên li taxê de stran gotin, Şêrzad bi dengê xwe navdar bû.

Heta niha tu stran tomar nekirine, lê dixwaze vê hêviyê pêk bîne. Girêdayî wê wiha axivî: "Heta niha min tu straneke taybet tomar nekiriye. Tenê li stranan guhdar dikim û jiber dikim. Piştre di şahiyan de dibêjim." **ANHA**

Sudoku: Bersiv 69

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 2 | 4 | 8 | 9 | 7 | 1 | 5 | 6 | 3 |
| 3 | 6 | 1 | 8 | 5 | 4 | 2 | 7 | 9 |
| 9 | 7 | 5 | 6 | 3 | 2 | 1 | 4 | 8 |
| 7 | 1 | 4 | 2 | 9 | 5 | 3 | 8 | 6 |
| 5 | 3 | 9 | 7 | 8 | 6 | 4 | 1 | 2 |
| 8 | 2 | 6 | 4 | 1 | 3 | 9 | 5 | 7 |
| 6 | 8 | 3 | 1 | 4 | 9 | 7 | 2 | 5 |
| 4 | 9 | 2 | 5 | 6 | 7 | 8 | 3 | 1 |
| 1 | 5 | 7 | 3 | 2 | 8 | 6 | 9 | 4 |

Sudoku:Pirs 70

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| | 4 | | 3 | | | 1 | 8 | 5 |
| 3 | | | | | | 9 | 4 | |
| | | | | | 2 | | 7 | |
| | | | 2 | | 9 | 6 | | 4 |
| | 5 | | | | | | 9 | |
| 2 | | 9 | 5 | | 8 | | | |
| | 2 | | 6 | | | | | |
| | 7 | 1 | | | | | | 3 |
| 8 | 3 | 4 | | | 7 | | 6 | |

## Quncika Têgînan

| | |
|---|---|
| **Aram** | **Asûde, amin, emîn, rehet, hêmin: Gundê me aram e, ti nexweşî û teşqele tê de nînin.** |
| **Asîmîlasyon** (Fransî) | Bi darê zorê helandina civekekê ji aliyê nasname, çand û ziman ve: Ji ber zordariya dagîrkeran bi milyonan Kurd asîmîle bûne. |
| **Berpirs** (Fransî) | Kesê ji ber karê kirî, yan erkê girtî ser xwe neçarê hesabdayînê ye. Mesûl: Berpirsê saziyê alîkarî belav kir. |
| **Kampanya** (Îtalî) | 1. Di qada siyasî, aborî, çand û hwd. de pêvajoya çalakiyan: Ji bo paqijkirina kolanan şaredariyê dest bi kampanyayê kir. 2. Ji bo firotinê, erzankirina mal. Bazirganan dest bi kampanya erzaniyê kiriye. |
| **Kompanya** (Îtalî) | Şirîkatî û hevpariya di bazirganiyê de. Bi giranî ji bo biyaniyan. Şirket, şerîke: Kompanya Amerîka petrolê dertîne. |
| **Operasyon** (Fransî) | 1.Rêzeçalakî. 2. Ji bo girtina sûcdaran rêzeçalakî. 3. Emelî. |
| **Pêşangeh** | Ji bo ger, dîtin û naskirinê, raxistin û bicîkirina berhemên hunerê. Her sal meha Nîsanê pêşangeha pirtûkan vedibe. |
| **Pêşbazî/pêşbirk** | Di zanebûn, behre, bedewî û hwd. de, karê ji bo nîşandana serkeftinê: Pêşbirka bazdanê dest pê kir. |
| **Vegotin** | Gotina berfireh. Îzah. Sedema çalakiya xwe bi berfirehî ji me re vegot. |
| **Venêrîn** | Kontrol, fehs: Li ser bendê endamên asayişê li her kesî venêrîn. Doktor li nexeweşan venêrî. |



# "Kongra Star: Keddayîn rûmet e, betalî bêrûmetî ye"

Kongra Star Roja Kedkaran a Cîhanê (1`ê Gulanê) pîroz kir û bang li hemû jinên kedkar û têkoşer kir ku pêşengiyê ji kar û kedê re bikin û tu kesê bê kar nehêlin.R-2

Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar :1060 | 30-Nisan- 2023 | www.ronahi.net/ku/

# HEYANÎ SERKEFTINÊ BERXWEDAN

Hikumeta Şamê careke din siyaseta dorpêçê bi awayekî girantir li ser herêma Şehbayê dide ferzkirin, her wiha Rêveberiya Xweser li Şehbayê da xuyakirin ku ger ev rewş dewam bike wê gel di zehmetiyên mezintir re derbas bibe.R-5



## KCK: Bi hestên 1`ê Gulanê tifaqa AKP-MHP'ê hilweşînin



KCK'ê 1'ê Gulanê li karkeran pîroz kir û bang li her kesî kir ku bi hestên yekitî û hevgirtinê 1'ê Gulanê bi xurtî pêşwazî bikin û bi van hestan piştgiriya Tifaqa Ked û Azadiyê û Partiya Çepên Kesk dikin û tifaqa AKP û MHP'ê hilweşînin.R-3

## "Pirojeya Netewa Demokratîk pirojeya herî guncav e ji bona çareseriyê"



Cîgirê Desteya Çand û Hunerê ya herêma Cizîrê Zeredeşt Îso da diyarkirin ku hikumeta Şamê ji çareseriyê dûr disekin e. Ji bona vê yekê hemû hewildanên Rêveberiya Xweser a bakur û rojhilatê Sûriyê piştguh dike. Zerdeşt Îso got: "Pirojeya Netewa Demokratîk pirojeya herî gûncav ya çareseriyê ye.R-4

## "Keziyên Kesk li dijî qirkirina xwezayê têdikoşe"



Rêveberê Insiyatîfa Keziyên Kesk Zîwer Şêxo diyar kir ku Keziyên kesk ji bo parastina xwezayê têkoşîneke dide meşandin û got, em di wê baweriyê de ne ku em ê her deverê Kurdistanê veguherînin qadên kesk.R-6

## "Hunermend Siruşt: Divê hunermend di mijarên netewî de xwedî helwest bin"



Hunermend Siruşt Kameran ku yek ji lîstikvanên rêze filmên komedî ye, got: "Eger budceyek baş hebe, sponserên baş hebin ku bikarîn karên baş bikîn, em ê bikarîn bandora rêze filmên biyanî ya li ser çanda Kurdî nehêlîn. Her wiha gelek giringe ku hunermend di mijarên netewî de xwedî helwest bin."R-7



Şam Li Benda Yên Li Şûna Erdogan E
Idrîs Henan R-5



HILBIJARTINÊN TIRKIYÊ JI BO SÛRIYÊ JÎ PIR GIRING IN!
DILYAR CIZÎRÎ R-4

# “Kongra Star: Keddayîn rûmet e, betalî bêrûmetî ye”

Kongra Star Roja Kedkaran a Cîhanê (1`ê Gulanê) pîroz kir û bang li hemû jinên kedkar û têkoşer kir ku pêşengiyê ji kar û kedê re bikin û tu kesê bê kar nehêlin.

**Navenda nûçeyan**

Meclisa Kongra Star bi minasebeta 1`ê Gulanê Roja Kedkaran a Cîhanê daxuyaniyek nivîskî weşand.

**Daxuyanî bi vî rengî ye:**

“Kar Azadî ye, Keddayîn jiyana bi rûmet e. Roja cejna kedkarên cîhanê li tevahî dayik, cotkar, karker û şoreşgerên kedkarên avakirin û azadkirina jiyana gelan ji koletî û zordestiyê pîroz be. Bi saya kar, xebat, berxwedan û keda Rêber Apo jin, zarok, mêr, pîr û kal bi rûmet û azad dijîn. Bi riya xwepêşandan û meşê bi ruhê têkoşîn û serhildanê ji aliyê çîna proleterya ve ku hejmarek karmend li herêma Chicago Haymarket di sala 1886’an de ku li ser rojekê heta heşt seatan karê xwe sekinandin û daxwaza kêmkirina seatên kar kirin. Lê belê desthilatdariya ku îrade û hebûna mirovan wek mirov nabînin, bû sedema şehîdxistina nêzî 11 karkeran. Bandora şehadeta wan bû sedema ku ev roj wek roja serhildan û berxwedana li hember kedxwariyê were pîrozkirin.

Bi derketin û pêşxistina endustryalîzmê re, ruxmê ku pêşketinên baş jî çêbûne, ji ber ku xweza û jiyana mirovan baş nekiriye û veguheriye çavbirçîtiyê û sermayeyê bûye weke nexweşiyeke li hember jin, civakê. Wekî ku Rêber Apo destnîşan dike: “Endustriyalîzmê li kevçika dilê cotkariyê xistiye. Cotkariya hêmanê bingehîn ê civaka mirov û amûrê hebûna wî ye, li hemberî endustriyê hildiweşe. Ev xebata pîroz a 15 hezar salan mirovahiyê li ser piyan girtiye îro di halê xwe de hatiye hiştin.” Ev neheqiya ku li hemberî nirxê keda mirov hê zêdetir bûye, ji ber ku di riya wê re qutbûna ji keddayînê bi taybetî di nava ax û erdê de çêbû, ev yek jî dibe sedema belavbûna betalî û bêkariyê weke nexweşiyekê di nava civakê de bi rengekî sîstematîk rê li ber koçberiya ji welat jî vedike.” Di nava vê sîstema ji jiyanê qut a herî bêqîmet hatiye hiştin jin e, ji ber ku her çiqasî bi têkoşîn û israra ji ber avakirin û parastina civak û hawirdorê ji xeterê wê li ber xwe dide jî lê ya herî ku ked, xebat û karê wê bê nirx tê dîtin û weke heqdesta erzan û bê berdêl hatiye hiştin ew e. Ji bo ku em careke din welatê xwe û civaka xwe azad bikin û jiyana cotkariyê biparêzin û nirxên keda destên xwe li hemberî makîne û amûrên sanaiyê wek robot li şûna mirovan tên şixûlandin bisekinin, pêwîst e em careke din vegera li gund, cotkarî û çandiniyê xurt bikin ji bo ku em jiyana ekolojîk û bi rûmet bijîn, ji ber ku betalî di jiyanê de bêrûmetî ye.

Bi navê Meclisa Kongra Star a Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê banga me ji hemû jinên kedkar û têkoşer re ew e ku pêşengiyê ji kar û kedê re bikin tu kesê bê kar nehêlin. Şoreş û biserxistina wê bi têkoşîn û kedê misoger dibe bila her roj bibin cejn û roja kedkarên cîhanê.”

# “Çeka herî mezin a jinê Îdeolojiya Rizgariya Jinê ye”

**Navenda nûçeyan**

**Endama Meclîsa PAJK’ê Ronahî Serhed diyar kir ku çeka herî mezin a jinê Îdeolojiya Rizgariya Jinê ye û got, di vê serdemê de her kes pêşengiya jinê dibîne û qebûl dike.**

Ronahî Serhed diyar kir ku çavkaniya pirsgirêkan hemûyan pirsgirêka jinê ye û got, “Tunekirina jiyanê bi êrîşa li dijî jinê dibe. Îdeolojiyên ku jinê ji bo xwe nakin navend, bi ser nakevin. Her çend jinan ji bo çareserkirina pirsgirêkan hewl dabin jî nekarîne çareseriyeke mayinde peyda bikin. Ji bo çareseriya pirsgirêkan pêwîstî bi îdeolojiyeke xweser a jinê hebû. Lewma îdeolojiya jinê hate afirandin. Lê belê îdeolojiya rizgariya jinê ne tenê rizgariya zayendekê ye. Divê bi wî rengî neyê fêhmkirin.

**‘Bi îdeolojya rizgariya jınê re jin bû xwedî têgihiştina xwe ya zayendî’**

Îdeolojiya Rizgariya Jinê cara destpêkê di sala 1998’an de kete rojeva me. Di encama ked û hewldanên mezin ên Rêber Apo di 8’ê Adara 1998’an de hate ragihandin. Vê yekê guhertinên mezin bi xwe re anî. Jin ji ber ku di bin pirsgirêkên civakî de dieciqî û zayenda destpêkê ya bindest bû, pêwîstî bi îdeolojiyeke bi vî rengî hebû. Heta ku pirsgirêka jinê nehatibûya çareserkirin mirov nekarî qala civakeke azad û demokratîk bikira. Yan jî tenê wê di asta propagandayê de bima. Îdeolojiya Rizgariya Jinê rêya peydakirina çareseriya vê yekê destnîşan kir. Kîjan rêxistin an jî îdeolojî bi rastî jî qala maf û hiqûqê dike, beriya her tiştî divê ji pirsgirêka jinê re çareseriyeke rasteqîn peyda bike.”

Ronahî Serhed diyar kir ku bi Îdeolojiya Rizgariya Jinê re jin bû xwedî hişmendiya zayendî û anî ziman, jin bi rastiya xwe zane, bi dîroka xwe zane û li gorî vê yekê nêzîkatiyê nîşan dide.

**‘Îdeolojiya rizgariya jinê destwerdaneke şoreşgerî ye’**

Ronahî Serhed diyar kir ku di dîroka mirovahiyê de gelek rewşên ne rewa weke rewa hatin dîtin û got, “Ev rewş pênc hezar sal in dewam dike. Destwerdan li jinê, jiyanê û rastiyê tê kirin. Îdeolojiya Rizgariya Jinê jî destwerdaneke şoreşgerî ya li vê destwerdanê ye. Destwerdana li bîrdozî û zimanê şaş e ku bi hezaran sal in ava bûne û hewldana sererastkirinê ye. Lewma ev pêngav beriya her tiştî destwerdana li sîstema bi serweriya mêr e, destwerdana li feraseta civaka zayendîperest e, li dijî feraseta moderNîteya kapîtalîst pêngaveke nû ye. Bi kurtasî li dijî mejiyê mêr ê kapîtalîst, serwer, li dijî çand, polîtîka û ilmê mejiyê mêr ê serwer, pêngaveke.




Di vê serdemê de timî tê gotin; dema îdeolojiyan qediya ye. Halbûkî li vê cîhanê tiştekî bêyî îdeolojiyê nîne. Her sîstem li ser îdeolojiya xwe ava dibe, bi pêş dikeve. Ji dema hilweşîna reel sosyalîzmê û vir ve hewl tê dayin ku îdeolojî marjînal, neyînî û dijberê civakê bê nîşandan. Lê belê sîstema kapîtalîst dema ku vê dike, ew bi xwe jî bi rêk û pêk êrîşeke îdeolojîk dike.”

**‘Îdeolojiya rizgariya jinê hêza çareseriya pirsgirêkan e’**

Endama Meclîsa PAJK’ê Ronahî Serhed anî ziman ku ew vê îdeolojiyê weke Îdeolojiya Rizgariya Jinê pênase dikin jî di rastiyê de îdeolojiya rizgariya civakî ye û wiha dewam kir: “Ji ber ku jin tê wateya civakê. Ji xwe pirsgirêka destpêkê û ya bingehîn, şaşitî, hîle derewa destpêkê talankirin û bindestkirina jinê ye. Lewma azadî jî divê li vê qadê pêk were. Kûrbûna di pirsgirêka jinê de, kûrbûna di çareseriya pirsgirêkên civakî de ye. Lewma Îdeolojiya Rizgariya Jinê jî hêza çareseriya van pirsgirêkan e. Bi taybetî gelekî girîng e ku di sedsala 21’ê de ev yek bê meşandin. Bi navê Tevgera Azadiyê ya Jinên Kurd em ne tenê ji civaka Kurd, her wiha ji têkoşînên civakî hemûyan re pêşengiyê dikin. Pêşengiya me bi îdeolojiya me tê qebûlkirin. Îdeoojî û tevgera ku vê yekê nebîne nikare mayinde bibe. Em jî bi vê îdeolojiyê pirsgirêkên civakî bi nêrîna jinê dinirxînin û hewl didin civakeke demokratîk, exlaqî, ekolojîk û azadîparêziya jinê biafirînin.”

Ronahî Serhed qala pîvanên bingehîn ên Îdeolojiya Rizgariya Jinê kir: “Ev pîvan ji bo Îdeolojiya Rizgariya Jinê girîng in. Pîvana destpêkê jî welatparêzî ye. Li gel vê yekê pîvana fikrê azad, îradeya azad, pîvana rêxistinî û parvekirina jiyaneke xwe dispêre azadiyê, pîvana têkoşîna bi hev re ya rêxistinbûyî û pîvana têkiliya bi bedewî, estetîk a jiyanê, bi giştî pênc pîvanên me yên bingehîn hene.”

**‘Armanc ew e ku jineke bi tenê jî bêrêxistin nemîne’**

Ronahî Serhed destnîşan kir ku li cîhanê eger mirov rêxistinî nebe nikare pelekî jî bihejîne û got, “Bi taybetî ji bo jinan derbasdar e. Ji bo hemû hêzên li cîhanê derbasdar e. Hingî tu nikare xwe bike hêza rêxistinbûnê. Mêr xwe bi rengê dewletê, bi rengê artêşên leşkerî bi rêxistin kiriye. Bi vî rengî xwe ji aliyê madî û manewî ve bi rêxistin kiriye. Jin jî divê xwe li hemberî vê sazîbûnê birêxistin bikin ku karibin têkoşîna xwe bi ser bixînin. Rêxistiniya bê kirin jî divê li gorî vê rastiyê berfireh û cidî be. Çeka herî mezin a jinan a li hemberî sîstema serweriya mêr ew e ku xwedî Îdeolojiya Rizgariya Jinê ye. Armanca bingehîn a rêxistiniya jinê, bêrêxistinhiştina jinê ye. Jin her roj ji ber tundiya mêr jiyana xwe ji dest didin. Rêxistinbûyîna jinê tê wateya rêxistiniya tevahiya civakê.”

Ronahî Serhed destnîşan kir ku PAJK bi kadro û milîtanên xwe di sedsala 21’ê de pêşengiyê ji avakirina jiyana azad re dike û got, “Gelê me ji zû deyî ev qebûl kiriye. Kes vê nîqaş nake; gelo jin kare vê bike, nikare bike. Her kesî hêz û pêşengiya jinê dîtiye û qebûl kiriye.”



# “Hunermend Siruşt: Divê hunermend di mijarên netewî de xwedî helwest bin”

Hunermend Siruşt Kameran ku yek ji lîstikvanên rêze filmên komedî ye, got: “Eger budceyek baş hebe, sponserên baş hebin ku bikarîn karên baş bikîn, em ê bikarîn bandora rêze filmên biyanî ya li ser çanda Kurdî nehêlin. Her wiha gelek giringe ku hunermend di mijarên netewî de xwedî helwest bin.”

Li Başûrê Kurdistanê li gor salên berê niha bi rêjeyek berbiçav jin di nava karên hunerî de tên dîtin. Lê jinên ku di warê lîstikvaniya komediyê de kar dikin, hejmara wan gelek kêmin. Sirûşt Kameran yek ji wan jinên lîstikvan ên hunera komediye. Ji ber jêhatina xwe ya di vê hunerê de di nava gel de tê naskirin.

Hunermend Sirûşt Kameran di hevpeyvînek taybet de behsa destpêkirina jiyana xwe ya hunerî û giringiya pêşxistina çand û hunera Kurdî kir.

‘Ji zarokatî ve heskirina min ji karê hunerê re heye’

Sirûşt Kameran di destpêkê de behsa jiyan û heskirina xwe ya ji hunerê re kir û got: “Ez li Silêmaniyê hatime dinê. Hîn ji temenê zarokatî de heskirina min ji karê huner û lîstikvaniyê re hebû. Min sitran digotin, min li beşa doblajê de kar kiriye. Min bi berdewam di kar û çalakiyên hunerî yên dibistanan de cih digrt.

Ji refa şeşem a dibistana seretayî ve min dest bi lîstikvaniyê kiriye. Karê min yê yekem şanoyek li ser kîmyabarana Helebçe bû. Wê demê mamostayên min destxweşiyek zêde li min kirin. Piştî min dibistana amadeyî temam kir, min karî li beşa pirtûkxaneyê xwendina xwe berdewam bikim. Di dema refa 12 a amadeyî de demek ji karê hunerê qut bûm. Lê bi berdewam min kar û çalakiyên hunerî dişopand.”

Di dewamê de Sirûşt behsa tevlîbûna xwe ya yekem di rêze filma komedî de jî kir û got: “Despêkê min bi karê cad destpêkir. Piştre di sala 2015’an de ez tevlî rêze filma profesyonelî bûm ku lîstikvanên wê bi ezmûn bûn. Ez gelek spasiya hunermend Kawa Qadir û Mahîr Hesen dikim ku wan bi berdewam alîkariya min kirin ku di karê rêzefilmên profesyonelî de beşdarbim. Bi taybetî Kawa Qadir têbîniyên giring bi min dida. Piraniya ew karên hunerî ku ez dihatim vexwendin yên komedî bûn.”



Di dewamê de Hunermend Siruşt diyar kir ku wê di gelek rêzefilman û şanoya milyoner ku bi qasî çar mehan berdewam kir de cih girtiye

‘Ragihandin û huner nêzî hevin’

Li ser heskirina xwe ya ji karê ragihandin û hunerê re jî Siruşt Kameran wiha axivî; “Li gor min ragihandin û huner du beşên gelek nêzî hevin. Min çar salan di radyo de kar kiriye. Lê zêdetir heskirina min ji lîstikvaniyê re tê. Malbata min gelek piştgiriya min kirine, bi taybetî jî babê min. Hertim ji min re digot netirsin. Niha jî hevjînê min piştgiriyek zêde ji min re dike û ew bixwe jî di vî warî de kar dike. Keçek min a temen 3 salî heye navê wê Kilo ye û ew gelek dixwaze li karên ku ez têde dixebitim temaşe bike.”

Di derbarê giringiya peywendiya derhênerên Kurd a bi hevre jî, Siruşt Kameran wiha axivî: “Mixabin peywendiyek baş di navbera derhênerên Kurd yên li Kurdistan û dervey Kurdistanê nîne. Lê ger peywendî hebe tiştek gelek baş e. Ji ber ku wê bibe sedema têkelbûna çand û ferhengê. Sedemê pêknehatina vê yekê jî ewe ku budceyek baş li ber destê me de nîne ku em bikarin karek mezin bikin û yekîtiyek hunermendan hebe û hunermendên her çar parçeyên Kurdistanê lihev kom bikin.”

‘Divê hunermend di mijarên nîştimanî de xwedî helwest bin’

Hunermend Siruşt Kameran destnîşankir ku divê hunermend di mijarên netewî de xwedî helwest bin û got: “Gelek giringe hunermend di mijarên nîştimanî de xwedî helwest bin. Ji ber ku di mijarên netewî de peyama hunermendan ji ya kesayetên siyasî zêdetir deng vedide.”

Di derbarê rêzefilmên biyanî û bandora wan a xirab ya li ser civakê de jî Hunermend Siruşt Kameran wiha axivî: “Eger budceyek baş hebe, sponserên baş hebin ku bikarîn karên baş bikin, em ê bikarîn bandora wan rêze filmên ku hewil didin çanda me xira bikin, nehêlin. Ji ber ku niha wisan lê hatiye ku jiyana me wek ya rêze filmên Tirkî lêhatiye. Bandora van rêze filmên biyanî di jiyana me ya rojane de xwe nîşan dide. Divê em hewil bidin xwe ji bandora van rêze filmên biyanî dûr bigrîn. Pêwîste hunermend bihevre kar bikin, nêrînên xwe bi hevre parve bikin daku bikarin karên baş bikin. Hêvîdarim bikarîn ku li gel hunermendên din dest bi dest karin baş bikin. Da ku bikarîn rêze filmên Kurdî çêkin û bigihînin asta rêze filmên cîhanî.” **ROJ NEWS**

# Wênsaza ciwan Denîz Osman


**Birûc Resûl/Qamişlo**

**Jina ciwan Denîz Osman di temenê 8 salî de dest bi wênesaziyê kir, nexweşiya penceşêrê jî li pêşiya jêhatiya wê nebû asteng, wê bi vîneke xurt li hemberî nexweşiyê li ber xwe da û di wênesaziyê de jî bi serket.**

Jina ciwan Denîz Osman ya 13 salî ku ji bajarê Qamişlo di temenê 8 salî de dest bi wênesaziyê kir. Di temenê 13’ê de nexweşiya penceşêrê pê re hat vedîtin. Denîz li hemberî nexweşiyê li ber xwe da, bi biryardariyeke mezin jiyana xwe dewam kir û di wênwsaziyê de jî xwe pêş xist. Denîz xewn û hêviyên ku di çar demsalan de di tabloyan de cih girtiye, nîşan dide ku jiyan diguhere û tiştek wek xwe namîne.

Denîz bi nexweşiyê dest bi jiyana xwe kir. Wê pêşangeha xwe ya yekem vekir, ku 67 tablo bûn, tê de wateyên hêviyê yên ji xwezayê pêçandine. Denîz gihaşt tiştê ku xeyal dikir. Ew li ser neynika xwe radiweste û porê xwe yê dirêj ku dîsa şîn bûye dixemilîne. Denîz ji me re wiha got: “Ji bo komkirina keziyên porê min, ên ku ji dermanên kîmyawî hatin weşandin, min tabloya xwe ya yekim de wêneyê keçeke ku bi porê xwe yê dirêj serbilind e, çêkir. Ev teşwîq û hêviyên min mezin e, min xwe iqnah kir ku ez ê şerê vê nexweşiyê bikim û xêzkirina wêneyan dewam bikim. Ji ber vê yekê wêneyê her tiştê min xêz kir, tişta ku destpêkê min xêz kir keziyên pora min bûn.”

Denîz wiha axaftina xwe dwam kir: “Ji xêzkirin û muzîkê û hem jî, ji şanoyan hez dikim, ji ber ku ez xwe di van bûyerên çandê de, yên xweş de dibînim û tevî hemû tiştên ku ez tê re derbas dibim, min dev ji xwendina xwe berneda, xwendin ji bo min tişta herî serekeye di jiyana min de. Di derbarê dibistana xwe de ez dixwazim



bibim wênesazek navdar, xewna min ew e ku bibim bijîşik, ku êşa mirovan derman bikim. Min di rêya Înternetê re fêrî xêzkirinê bûm, ez ji xêzkirinê hez dikim û piraniya dema xwe ya vala pê re derbas dikim, ez bi saetan di odeya xwe de dimînim heya ku wêneyê xwe biqedînim, lê îmkana min pir kême. Ji ber ku mewadên wekî rengên xêzkirinê peyda nabin , ev ji bo her hunermendekî astenga herî mezin e.

Denîz wiha axavtina xwe bi dawî kir:”Min gelek kesên ku di jiyana xwe de bi pirsgirêkên nexweşiya pencaşêrê re rû bi rû min derbas kir. Her wiha tabloyên min yê tije ken û hêvî yê bi xewnê xwe xêz kir. Ji ber vê yekê, her kesê ku bi nexweşî û pirsgirêkên dijwar re rû bi rû derbas dibin, ku li hemberî van zehmetiyan bisekinin, teslîmbûn destpêka bêhêvîtiyê ye, ez hêvî dikim ku her kes xewnek ji xwere peyda bike. Bi jiyanê re hîn zêdetir bi hêvî xwe girê bide.”

# Li Bayinganê mihrîcana erbaneyê hat lidarxistin

**Li bajarokê Pawe Bayinganê merasîma erbaneyê bi beşdariya bi sedan hunermendên ku ji bajarên cuda yên Rojhilatê Kurdistanê hatibûn û bi amadebûna bi hezaran mêvanan li Bayinganê hat lidarxistin.**

Roja pêncşemî 27’ê Nîsanê, bi amadebûna bi hezaran mêvanên ku ji bajarên din ên Rojhilata Kurdistanê û seranserê Îranê hatibûn Bayinganê, li bajarokê Bayingan ê Pawê, rêûresmek bi navê festîvala mezin a erbaneyê hat lidarxistin. Ev merasîma ku bi hewldana kesên li erbaneyê didin pêk hat, li Pawe, Ciwanro û Merîwanê hat amadekirin. Li sînorê bajarokê Bayingan ku yek ji bajarên seyr û gavê yên herêma Hewramanê ye, hat lidarxistin. Hebûna erbeneyan û temaşevanan li ser banê xaniyan, dîmenên xweş û rengîn çêkir.

Beşdariya jinan balê kişand

Hunermendên erbaneyê bi performansa xwe ya xweş û delal temaşevanan kêfxweş kirin. Yek ji xalên herî balkêş û berbiçav ên vê çalakiyê, beşdariya jinan bû. Hem di nava hunermendan de hem jî di nav temaşevan û mêvanan de xwe dida der. Ev amadebûna ku bi redkirina hicaba ferzkirî ji aliyê rêjeyeke zêde ya wan ve, atmosfereke cuda dabû vê merasimê.

Gotinên rayedarê hikumetê bû sedema bertekan



Ji rayedarên hikûmetê li ser dikê ji jinan re got ku hicabê bi awayê ferzkirî li xwe bikin, ev yek jî bû sedema bertekeke tund a jinan. Piştî berxwedana jinan, berpirsê navborî neçar ma qala desthilatdarî û hinceta xwe bike û gotinên xwe bi awayekî rewa bike.

Pêşangehek jî hat vekirin

Li kêleka vê rêûresmê, pêşangehek bi çendîn standên firotina berhemên dest û xwarinên xwecihî ku piraniya wan ji aliyê jinan ve dihatin birêvebirin, hat vekirin. Ev pêşangeha ku li dergehê Bayinganê hatibû lidarxistin, ji aliyê mêvanan ve bi taybetî mêvanên ne Kurd ve bi awayê baş hat pêşwazîkirin.

Hêjayî gotinê ye ku di vê merasimê de gelek mêvan ji Tehran û seranserê Îranê amade bûn.

Ji bo ku beşdarî kêm bibe cihê merasimê guherandin

Di salên derbasbûyî de ev merasîm li gundekî din ê herêma Hewraman, Palanganê hat lidarxistin. Li gorî hin mêvanan, guhertina cihê şahiyê, ji ber ku li Palenganê pir serkeftî bû, ji ber tirsa dezgehên hikûmetê ji kombûna xelkê bi taybetî jinan bûye. Her wiha bijartina Bayingan li şûna Palengan ku navên wan dişibin hev, bi qestî û ji bo kêmkirina beşdariya gel û hunermendan di vê merasimê de hatiye kirin. **JÎNHA**

# “Keziyên Kesk li dijî qirkirina xwezayê têdikoşe”

**Rêveberê Insiyatîfa Keziyên Kesk Zîwer Şêxo diyar kir ku Keziyên kesk ji bo parastina xwezayê têkoşîneke dide meşandin û got, em di wê baweriyê de ne ku em ê her deverê Kurdistanê veguherînin qadên kesk.**

**Birûc Resûl/Qamişlo**

Kêmbûna rûbera kesk li seranserî cîhanê, pirbûna rêjeya şewatan û di heman demê de jî belavbûna gazên ku ba û xwezayê qirêj dikin, bandoreke neyînî li ser jîngehê û pirbûna zindîwarîyê kir û bi dest xwe re bandor li ser hevsengîya jîngehî û tenduristîya giştî kir. Tevaya Sûriyayê û bi taybetî herêma bakur û rojhilatê Sûriyayê jî parçeyek ji vê êşa jîngehê ye ku bûye derdê tevaya cîhanê, nemaze di van salên dawîyê de. Di encama şerên ku derketin de jîngeh wêran bûye. Rêjeya tûşbûna bi nexweşîya penceşêrê li herêma Cizîrê, li gor hevrûkirina bi herêmên din ên Sûriyayê re, rêjeya wê gelek bilind û metirsîdar bûye; her wiha dabînkirina rajeguzarîyên bijîşkî jî pir zehmet bûye.

Li baklur û Rojhilatê Sûriyê ji bo parastina jîngehekê û tenduristiyê, her wiha ji bo avakirina têkilîyeke baş di navbera mirov û xwezayê de, komek çalakvan, xwebexş û akademîsyenên Insiyatîfa “Kezîyên Kesk A Jîngehî” damezirand.

Gelek pispor û akademîsyenên jînegh û çandinîyê, her wiha xwebexş û çalakvanên sivîl ên guh didin mijara jîngehê, cihê xwe di Keziyên Kesk de digirin.

Di cotmeha 2020’an de Keziyên Kesk dest bi xebata xwe kir. Armanca wê jî, çandina çar milyon dar di nava pênc salan de ye. Ev yek dibistan, zanîngeh, sazîyên kargêrî, darsitan, bistanên pîşesazî, rûberên çandinîyê yên vala û ji darçandinê re guncav in ku tê de mercên çandinîyê peyda ne û parêzgehên xwezayî yên li ber kêmbûna rûberê, bi temamî di nava xwe de digire.



Derbarê kar û xebatên Insiyatîfa Keziyên Kesk, rêveberê Keziyên Kesk Zîwer Şêxo ji me re axivî.

Zîwer Şêxo diyar kir ku projeya Keziyên Kesk projeyek ji bo parastina jîngehê ye û wiha got: “Ji ber guherîna avhewayê û çolbûnê, herwiha Ji ber şert û mercên şer ên li herêmê, ne tenê mirovan ziyan dîtin, jîngehê jî zerarên mezin dîtin. Ji bo parastina jîngehê Insiyatîfa Keziyên Kesk dest bi kar û xebatê Kir. Piştî dagirkirina Efrînê, em demekê li herêmên Şehbayê man, piştre em derbasî bajarê Qamişlo bûn. Di Projeyên Keziyên Kesk de, li gor erdnîgariya heremê darên fêkî û daristanî bi taybetî darên hêjîr û rezan tê çandin.”

Şêxo di berdewamiya axaftinê xwe de destnîşan kir ku gelek sazî beşdarî vê projeyê bûne û bi taybetî Rêxistina Têkoşîna li dijî Tundiya li ser Jinê, Kongra Star û hin endamên saziyên din ên jinê bi aktîv tevlî bûn.”

Şêxo balkişand ser girîngiya beşdarbûna tevahiya gel di pirojeyên Keziyên Kesk de û got: “Ev ne tenê berspirsyariya Rêveberiya Xwesere, di heman demê de ji li heremê keskahî bê zêdekirin berpirsyariya civakê heye û her kesê têkîldar dike. Bi vî awayî em dikarin heremên xwe bi keskahiyê bixemilînin. Her wiha di nava xebatên projeya Kesk de pîspor û kesên xwedî tecrûbe jî cihê xwe digirin.

Zîwer wiha domand: “Cara yekê ye li Bakur û Rojhilatê Suriyê dibistana jîngehî çêdibe. Li her dibistaneke li herema Cizîrê mamosteyek hatiye diyarkirin û weke berpirsyarê komîteya ekolojiyê tevbigerin. Ev mamosteyên hatine erkdarkirin ji aliyê Keziyê Kesk ve tên perwerdekirin. Bi vî awayî li her dibistanekî de çanda ekolojiyê pêş bikeve. Û her mamoste jî erka wan e ku xwendekaran fêrî zêdekirina daran bikin û meştelên biçûk di dibistanan de çêbikin. Ev yek weke çalakiyeke salane ya xwendekaran be.”



Zîwer Şêxo da zanîn ev proje projeya gelê Rojava ye û bang li gel kir ku li hemberî xweza û jîngehê berpirsyariyên xwe bi cîh bînin û wiha dawî li axavtina xwe anî: “Em hewl didin ku Keziyê kesk li hemû parçeyên Kurdistanê zêde bikin, hêviyên me di vî warî de zêde ne û em di wê baweriyê de ne ku emê wan deveran veguherînin qadên kesk.”



# Roja Karkerên Cîhanê roja rûmeta me ye”

**Norşîn Sîno/Qamişlo**

**Karkerên bajarê Qamişlo diyar kirin ku Roja Karkerên Cîhanî , roja rûmeta wan e û gotin , em Roja Karkerên Cîhanî rojeke pîroz dibînin û emê hewil bidin ku herdem bi pêş kevin.**

Roja Cîhanî ya Karkeran, li hin welatan jî wekî cejna Karkeran tê nasîn. Her sal di 1`ê Gulanê de ,pîrozbahiyek salane li gelek welatan ji bo pîrozkirina karkeran tê lidarxistin, ku ji hêla tevgera kedkar, komunîst û sosyalîst ve tê organîze kirin. Her sal li piraniya welatên cîhanê di 1ê Gulanê de tê pîrozkirin û li hejmarek ji wan jî cejna fermî ye.

Bi destpêkirina şoreşa pîşesazî li Brîtanyayê, hilberîna pîşesazî di kargehên mezin de jiyana karkeran veguherand dojehê, û roja xebatê di navbera 10-16 saetan de bû, û hefteya xebatê heya 6 rojên hefteyê bû. bikaranîna zarokan berbelav bû, bêyî ku ji bo ewlekariya pîşesazî û tenduristiyê an jî Belavbûna êş û nexweşiyan di nav karkeran de, bi taybetî zarokan, were hesibandin. Ev yek bû sedem ku tevgera “Rojê 8 saetan” derkeve holê, yek ji tevgerên civakî ku armanca wê birêkûpêkkirina roja xebatê û pêşîgirtina li binpêkirin û binpêkirinan e. Ji bo ku westandina karkeran binirxînin û mafên xwe bidin wan, tevî hemû dijberan cejna xwe kirin û cara yekem li Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê hat pîrozkirin.





Derbarê Roja Karkeran a Cîhanî Karkerên Bajarê Qamişlo ji me re axivîn û hestên xwe anîn ziman.

**` Roja Karkerên Cîhanî rûmetdayîn ji bo karkerane`**

Karkerê bi navê Elî bîjo yê ji bajarê Qamişlo ku li qada pîşesaziyê dixebite, diyar kir ku ew kêfxweşe bi Roja Cîhanî ya Krkeran ji ber ku dibîne wek rûmetdanî ji bo wan e û wiha got: “Em wek karker pir kêfxweşin bi Roja Cîhanî ya Karkeran , ji ber ku em wek rûmetdayîn ji xwe û karê xwe re dibînin . Em ji sibehê ve ta êvaran kardikin û diwestin ji bo em xwe bidin jiyankirin , û hr roj li ser vê rewşê moralên me pir dişkê , lê dema ku em rûmeta karê xwe ji aliyê tevayî Cîhanê dibînin em xwe nasdikin û pir kêfxweş dibin “

**`Daxwaza me bêhtir bi Pêşkêşkirina pêdiviyên kar heye `**

Elî Bîjo daxwaza bêhtir pêşkêşkirina pêdiviyên kar kir û wiha axaftina xwe bidawî kir: “Di dawiyê de daxwaza me bi pêşkêşkirina pêdiviyên kar bêhtir heye, wek elektrîkê. Ji ber ku karê me hemû li sere û kêmbûyîna wê zerarê dighîn karê me , her wiha pirsgirêka gemara ku li pêş dikanên me kom dibe , divê bê çareserî kirin , ji ber ku hin astengiyan ji me re çêdikin . Herwiha hêviyên me yên pir mezin hene ku em pêş bikevin.”

**‘Hesteke mezine ku Cîhan bi me pîroz dibe’**

Karkerê bi navê Mihemed Farûq yê ku di firneya nan de kardike hestên xwe yên pir mezin bi me re parvekir û wiha axivî: “Ez wek karker xwe di roja Cîhanî ya Karkeran xwe dibînim , ji ber ku di vê rojê de hemû Cîhan me nasdikin û bi me pîroz dibin . Di heman demê de jî em karê xwe rûmeta dibînin. “



**‘Em dixwazim ku zêdetir pêşbikevin ‘**

Mihemed Farûq destnîşan kir ku ewê hewl bidin ku karê xwe de pêş bikevin û wiha gotina xwe bidawî kir : “ Em dixwazin ku bêhtir di karê xwe de biser bikevin , him ji bo xwe û him jî ji bo welat û welatiyên xwe , ji ber ku karê me ne ji bo me tenê ye ji bo hemû welate .”



# KCK: Bi hestên 1`ê Gulanê tifaqa AKP-MHP’ê hilweşînin

KCK`ê 1`ê Gulanê li karkeran pîroz kir û bang li her kesî kir ku bi hestên yekitî û hevgirtinê 1’ê Gulanê bi xurtî pêşwazî bikin û bi van hestan piştgiriya Tifaqa Ked û Azadiyê û Partiya Çepên Kesk dikin û tifaqa AKP û MHP’ê hilweşînin.

Hevserokatiya Konseya Rêveber a KCK’ê bi wesîleya 1’ê Gulanê bang li her kesî kir ku piştgiriyê bidin Tifaqa Ked û Azadiyê û Partiya Çepên Kesk.

Peyama KCK’ê ya ji bo 1’ê Gulanê Cejna Karkeran wisa ye:

“Em 1’ê Gulanê roja ked, hevgirtin û têkoşînê di serî de li çîna karkeran ya hemû gel, jin û bindestan pîroz dikin. Ji ber ku 1’ê Gulanê bûye rojeke dîrokî û tê pîrozkirin, bi berdêlên mezin û di encama têkoşînê de pêk hatiye. Di vî warî de 1’ê Gulanê hem cejna karker, kedkar û bindestan e, hem jî tê wateya berxwedan û têkoşînê. Em careke din di şexsê şehîdên 1’ê Gulanê de hemû şehîdên şoreş û demokrasiyê bi bîr tînin û soza berxwedan, têkoşîn û serkeftinê ya ku me dabû şehîdan dubare dikin.



Têkoşîna çîna karkeran a li dijî pergala kapîtalîst a mêtingeriyê di dîroka mirovahiyê de xwedî cihekî girîng e. Têkoşîna çîna karker û kedkaran a ji bo wekhevî, azadî û demokrasiyê, weke berdewamiya têkoşîna dîrokî ya mirovahiyê pêş ketiye û mîrateyeke mezin ji mirovahiyê re hiştiye. Têkoşîna çîna karkeran a ku bi îdeala jiyana sosyalîst pêş ket, ji bo civakê di warê newekhevî û mêtingeriyê hişyar bike û karakterekî têkoşer bi dest bixe, tevkarî li hemû mirovahiyê kir. Di vî warî de têkoşîna çîna karkeran cihê xwe di têkoşînên wekhevî û azadiyê de girtiye ku di dîrokê de xwedî karaktereke gerdûnî ye û di vê astê de pêşketinan diafirîne.

Îdealên di 1’ê Gulanê de, ku lêgerîna wekhevî û azadiya çîna karker, kedkar, jin û gelên bindest îfade dike, îro wateya xwe winda nekiriye. Îro mêtingeriya ku ji modernîteya kapîtalîst derdikeve pir zêde bûye, newekhevî kûr bûye, talan û wêrankirina xwezayê; pêşxistina pergala xizanî, şer û qetlîamê, îdeala cîhanek wekhev, azad û bêmêtingerî di 1’ê Gulanê de anî ziman û têkoşîna ji bo van îdealan hîn girîngtir kir. Di vî warî de pîrozkirina 1’ê Gulanê ya bi xurtî û mezinkirina têkoşînê ji bo jiyînê, ji her demê zêdetir pêdivî pê heye.

Şoreşa Kurdistanê û têkoşîna gelê Kurd ji destpêkê heta roja me ya îro pêkanîna daxwazên çîna karker, kedkar, jin û gelên bindest ên wekhevî û azadiyê ye. Rêber Apo ji bo pêşxistina têkoşîna sosyalîzmê di nava lêgerîneke mezin de bû û ev yek bi avakirina tevgera PKK’ê û destpêkirina têkoşîna li dijî mêtingeriyê nîşan da.

Taybetmendiya herî girîng a 1’ê Gulanê pêşxistina yekitî û hevgirtinê ye û bindest encax bi yekîtî û hevgirtinê wê di têkoşîna li dijî mêtingeriyê de bi ser bikevin. Ji ber ku ji bo serkeftina têkoşîna wekhevî û azadiyê gelekî girîng e ku yên li dijî fermana mêtingeriyê têdikoşin yekîtî û hevgirtina xwe xurt bikin. Ji ber vê sedemê pêşengên çîna karkeran ku dîrok nivîsandine, bal kişandin ser girîngiya yekîtî û hevgirtinê û ji bo pêşxistina yekîtiyê hewl dan. Îro li hemberî kûrbûna mêtingeriya modernîteya kapîtalîst ji berê zêdetir pêwîstî bi yekîtiyê heye. Rêvebirên tevgera sosyalîst a Tirk bi helwestên xwe ev yek nîşan didin. Rêber Apo her wiha helwesta hevpar a Denîz, Mahîr û Îbrahîm berdewam kir û ji bo hevgirtin û hevpariya têkoşînê ya gelê Kurd û gelên Tirkiyeyê kedeke mezin da. Tevgera me bi hişmendiya têkoşîna hevpar girîngiyê dide yekîtiya gelên Rojhilata Navîn, bi taybetî jî hevgirtina têkoşîna azadiyê ya gelê Kurd û têkoşîna gelên Tirkiyeyê û çîna karkeran. Tifaqa Ked û Azadiyê ya ku ji aliyê gelê Kurd û hêzên şoreşger û demokratîk ên Tirkiyeyê ve hatiye avakirin, ji bo yekîtî û hevgirtinê gaveke gelekî girîng e. Di demeke ku Tirkiye di pêvajoyeke girîng a hilbijartinê re derbas dibe, gelê Kurd û gelên Tirkiyeyê weke tifaqa Ked û Azadiyê li dijî desthilatdariya faşîst a AKP-MHP’ê bûne yek. Di vî warî de divê her kesê alîgirê demokrasî, azadî, wekhevî û edaletê ye, ji bo ku Tifaqa Ked û Azadiyê û Partiya Çepên Kesk di hilbijartinan de xwedî hêzeke xurt bin, têbikoşin. Parastina mîrateya Denîz, Îbrahîm, Mahîr û têkoşîna sosyalîzmê, bi taybetî jî bîranîna kesên di 1’ê Gulana 1977’an de şehîd bûne, vê yekê ferz dike. Tevgerîna bi van hest û ramanan di heman demê de pêkanîna daxwazên Rêber Apo ye. Bi hestên yekîtî û hevgirtinê em 1’ê Gulanê li hemû kedkar, gelên bindest û jinan bi taybet çîna kedkaran pîroz dikin û bang li hemû kesan dikin ku bi coşa 1’ê Gulanê pêşwazî bikin û di hilbijartinan de piştgiriyê bidin Tifaqa Ked û Azadiyê û Partiya Çepên Kesk û da ku tifaqa AKP û MHP’ê were hilweşandin.”

# Beyannameya çareseriyê pêşkêşî aliyên herêmî û navneteweyî hat kirin

**Hemdan El Ebid diyar kir ku wan beyannameya çareseriyê pêşkêşî Komara Ereban, Neteweyên Yekûyî, rêxistinên mirovî, hêzên demokrat û hikumeta Şamê kir. El Ebid got: “Divê çareserî sûriyayî û li ser xaka Sûriyeyê be.”**

Rêveberiya Xweser di çarçoveya xebatên xwe yên bi armanca çareserkirina aloziya Sûriyeyê de, di 18`ê Nîsanê de beyannameyek ji 9 bendan pêşkêş kir.

Cîgirê Hevserokatiya Meclisa Rêveber a Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê Hemdan El Ebid bal kişand ser tevgerên Rêveberiya Xweser ên têkildarî beyannameyê.

Hemdan El Ebid diyar kir ku Rêveberiya Xweser ji dema ku hatiye damezirandin ve, gelek caran hewl da diyalogên nîştimanî di navbera hemû hêzên sûriyayî de li dar bixe da ku alozî were çareserkirin.

El Ebid anî ziman ku Rêveberiya Xweser banga parastina yekîtiya xaka Sûriyeyê dike û got, destwerdanên herêmî û navneteweyî yên li Sûriyeyê sedema kûrbûna aloziyê ye.

Têkildarî tevgerên piştî ragihandina beyannameyê El Ebid wiha got: “Me beyannameya çareseriyê nîşanî aliyên herêmî û navneteweyî yên wekî Komkara Ereban, Neteweyên Yekbûyî, rêxistinên mirovî, hêzên demokrat û hikumeta Şamê kir da ku çareserî sûriyayî, li ser xaka Sûriyeyê be û di qada navneteweyî de were qebûlkirin. Me ev beyanname pêşkêşî Rêxistina Mafên Mirovan, Konseya Ewlekariyê ya Neteweyên Yekbûyî û aliyên li Sûriyeyê jî kir.”



El Ebid destnîşan kir ku wan bang li Komkara Ereban kir ku roleke çalak li herêmê bilîze û bang li Neteweyên Yekbûyî jî kir ku aloziyê li gorî biryara 2254`an çareser bike.

El Ebid got: “Me ji wan xwest ku divê çareserî ya bêyî parçebûn an jî cûdakirin di çarçoveya xaka Sûriyeyê de pêk were.”

Cîgirê Hevserokatiya Meclisa Rêveber a Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê Hemdan El Ebid da zanîn ku hinek hêzên herêmî û navneteweyî wekî Tirkiye, Rûsya û Îranê helwestên ne erênî nîşanî beyannameyê didin û got: “Sedema vê yekê ew e ku ev beyanname ne li gorî berjewendiyên wan in, ji ber ku berjewendiyên xwe di ser hesabê gelê Sûriyeyê re dibînin.” **ANHA**

# “Ramanên Rêber Abdulah Ocalan bû bingeha destkeftiyên gelên azad”

**Endamê Partiya Neteweyî ya Civakî ya Sûriyayî Ebdulhemîd El Hayik destnîşan kir ku fikr û felsefeya Rêber Abdullah Ocalan mîsogeriya parastina deskeftiyan e û got, pêkanîna azadiya wî ya fîzîkî erka rêxistinên mirovî û hiqûqî ye.**

Li dijî Rêber Abdullah Ocalan tecrîdeke giran hatiye ferzkirin, her sê mehan `Cezayê dispilînê` li dijî wî tê birîn û ji qanûna mafên hêviyê bêpar tê hiştin.

Neteweyên Yekbûyî muhleta heta dawiya Adara 2023`yan dabû dewleta Tirk da ku sedemên qedexekirina hevdîtina bi Rêber Abdullah Ocalan re şîrove bike. Lê dewleta Tirk heta niha tu şîrove nedeye û Neteweyên Yekbûyî jî bêdeng e.

**`fikrê rêbertî zihniyeta dûrxistinê ji holê radike`**

Endamê Partiya Neteweyî ya Civakî ya Sûriyayî Ebdulhemîd El Hayik tecrîda girankirî ya li ser Rêber Abdullah Ocalan nirxand. Ebdulhemîd El Hayik diyar kir ku armanca tecrîdkirinê pêşîgirtina li ber belavûna fikrê Rêber Abdullah Oclan e û wiha domand: “Tirkiye felsefeya Rêber Abdullah Ocalan wekî xetereyekê li ser xwe dibîne, ji ber ku Rêber Abdullah Ocalan banga rizgarkirina jinan ji hemû cûreyên zilm û zihniyeta bavikslarî ya desthilat a li ser civakê dike. Her wiha banga beşdarkirina jinan di hemû qadên jiyanê de dike û banga pêkanîna edaleta civakî, siyasî û wekheviya di navbera hemû ferdên civakê de dike.”

El Hayik ramanê Rêber Abdullah bi kilîta çareseriyê wesif kir û got: “Em di fikrê Rêber Ocalan de çareseriyeke berfireh û giştî ji bo jiyana hevbeş li bakurê rojava û bakurê rojhilatê Sûriyeyê dibînin. Nêrînên Rêber Abdullah Ocalan xwe dispêre hilweşandina zihniyeta înkarkirin û dûrxistina pêkhateyên herêmê. Ramanê Rêbertî hesasiyeta rejîma Tirkiye ya di mijara tevahî Sûriyeyê de di ber çavan re derbas dike.”

**Azadiya Rêber Abdullah Ocalan**

El Hayik got, fikr û felsefeya Rêber Abdullah Ocalan ku banga azadî, demokrasî û pirrengiyê dike, osmaniya îxwanî a ku li ser zilm û pişaftina gelan ava bûye ditirsîne, lew ra derketina wî ji girtîgehê wê bibe destpêka hilweşandina pergala osmanî.

Siyasetmendar Ebdulhemîd El Hayik pergala îşkenceyê ya li Îmraliyê bi siyaseta qirkirin a xeternak bi nav kir û wiha domand: “Armanc ji vê siyasetê ew e ku têkoşîna parastinê ya Kurdên Sûriyeyê ya li dijî dagirkeriyê ji holê were rakirin. Dewleta Tirk hemû peyman û qanûnên navneteweyî yên der barê mafên mirovan de binpê dike.”

El Hayik li ser helwesta Partiya Neteweyî ya Civakî ya Sûriyeyî ya têkildarî tecrîdê jî got: “Ji bo ku doza Rêbertî bighêje tevahî rêxistinên miriovî û hiqûqî, ji bo ku Rêbertî ji girîgeha dermirovî were azadkirin hevgirtin û piştevanî pêwîst e.”



Endamê Partiya Neteweyî ya Civakî ya Sûriyayî Ebdulhemîd El Hayik di dawiya axaftina xwe de destnîşan kir ku bi saya fikr û felsefeya Rêber Abdulalh Ocalan gelên demokrat ên azad destkeftî bi dest xistine û got, pêkanîna azadiya fîzîkî ya Rêber Abdullah Ocalan erka tevahî rêxistinên mirovî û hiqûqî ye. ANHA

# "Pirojeya Netewa Demokratîk pirojeya herî guncav e ji bona çareseriyê"

Cîgirê Desteya Çand û Hunerê ya herêma Cizîrê Zeredeşt Îso da diyarkirin ku hikumeta Şamê ji çareseriyê dûr dise-kin e. Ji bona vê yekê hemû hewildanên Rêveberiya Xweser a bakur û rojhilatê Sûriyê piştguh dike. Zerdeşt Îso got: "Pirojeya Netewa Demokratîk pirojeya herî gûncav ya çareseriyê ye.

**Zana Roj/ Qamişlo**

Aloziya Sûriyê piştî 11 salan gihîştiye lûtkeya pirsgirêk û xetimandinê. Her weha di Rojhilata Navîn de bûya navenda şerê cîhanê yê siyemîn. Tavahî hêzên hegemon siyaseta xwe ji bo berjewendiyên xwe li ser erdnîgariya Sûriyê didin meşandin. Li hember van siyasetên ku tên meşanidn rêveberiya xweser bi pirojeya xwe ya Netewa Demokratîk çareseriya herî guncave ji bo aloziya sûriyê. Ji bo çareserkirina pirsgirêka tevahî Sûriyê, di 18 ê Nîsanê de Rêveberiya Xweser a bakurd û rojhilatê Sûriyê beyanemeyek ji 9 xalan pêşkêş kir.

Têkildarî kirîza Sûriyê û pirojeya Netewa demokratîk a ji bo çareseriyê , herwiha derbarê helwesta hikumeta Şamê, Cîgirê Desteya Çand û Hunerê ya herêma Cizîrê Zeredeşt Îso ji rojnameya me re axivî.

### 12 sal ji rijandina xwîna gelên Sûriyê

Zeredeşt di destpêka axaftina xwe de anî ziman ku hikumeta Şamê li ser xwîna gel temenê aloziya Sûriyê dide dirêjkirin û got: "Aloziya Sûriyê her ku diçe ber bi pirsgirêkên kurtir ve diçe. Hikumeta Şamê ji bo dest ji serweriya xwe bernede ev bû 11 sal in li ser xwînrijandina gelê Sûriyê xwe dide domandin. Gel ji van kirîz û aloziyan bêzar bûye, herwiha tu destwerdanên ji derve jî ji bo bidawîkirina van aloziyan nayên kirin."

### 'Pirojeya Netewa Demokratîk xwe da îsbatkirin'

Zeredeşt da diyar kirin ku Rêveberiya Xweser bi hilbijartina xeta sêyemîn di aloziya Sûryê de û bi pêkanîna pirojeya Netewa Demokratîk karî xwe ji cîhanê re bide îsbat kirin û wiha domand: "Di aloziya Sûriyê de gelê Kurd xeta sêyemîn



hilbijart û bi pirojeya Netewa Demokratîk, gelên herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê xwe bi rêxistin kirin, her wiha bi vê îdeolojiyê gelek destkeftiyên mezin bi dest xistin, li ser vî esasî pirojeya Rêveberiya Xweser ya demokrasiya gelan li ser asta cîhanî xwe da îsbat kirin."

### 'Hikumeta Şamê rê li pêşiya danûstandinan venake'

Zeredeşt di axftina xwe de anî ziman ku Rêveberiya Xweser ji bo bidawîkirina aloziyî û qeyranên ji 11 salan ve tên jiyan kirin gelek danûstandin kirin û wiha got: "Çareserkirina aloziya Sûriyê wê bi destê gelê Sûriyê be, ji destpêka avakirina sîstema Rêveberiya Xweser di bakur û rojhilatê Sûriyê de, gelek hewildan û danûstandin bi hikumeta Şamê re kirin e, lê belê hikumeta Şamê heyanî vê kêliyê ji bo gihîştina çareseriyeke hevbeş ku bikeve xizmeta gelên Sûriyê, qebûl nekiriye. Bi vî awayî tê diyar kirin ku hikumeta Şamê ji bo berjewendiyên xwe her xwestiye temenê aloziyê dirêj bike û tu deriyên gihandina çareseriyeke bingehîn venekiriye."

### 'Derveyî çareseriya Sûrî Sûrî wê tu çareseriyên din ne pêkan bin'

Zeredet da xuya kirin ku di Suriyê de derveyî çareseriya Sûrî Sûrî wê tu alî ji bo çareseriyê nebin bersîv û wiha domand: "Destwerdanên ku ji dewletên derve de ji bo Sûriyê tên kirin tavahî ji bo perçekirina xaka Sûriyê ne, derveyî xizmeta berjewendiyên xwe yek gav jî nedane avêtin û di heman demê de hikumeta Şamê jî van nêzîkatiyan qebûl dike. Rêveberiya Xweser ji bo neqebûlkirina vê yekê û rê li hember perçekirina Sûriyê bide girtin, pirojeya çareseriya Sûrî Sûrî da pêşkêş kirin. Lê rûxmî îsrarkirina Rêveberiya Xweser ji bo pêkanîna vê yekê, hikumeta Şamê rê li ber lihevkirin û têkiliyan venake ."



### "Armanca civînên çar alî pûçkirina Rêveberiya Xweser e'

Cîgirê Desteya Çand û Hunerê ya herêma Cizîrê Zeredeşt Îso di dawiya axaftina xwe de destnîşan kir ku civînên çar alî yên ku tên lidarxistin wê tavahî ji bo hedefgirtin û tengavkirina Rêveberiya Xweser bin û wiha got: "Dewletên weke Rûsiya, Tirkiyê, Îran û Emerîka yên ku roleke sereke di perçekirina Sûriyê de dilîzin, her dixwazin li ser xaka Sûriyê bazarên nû bidin çêkirin ku bikeve xizmeta berjewendiyên wan de, ji ber vê yekê jî ji bo têkbirina pirojeya Netewa Demokratîk û pûçkirina Rêveberiya Xweser pilanên nû didin gerandin."

---

### Hilbijartinên 14'ê Gulanê


**Elî Roj**

Bi nêzîkbûna hilbijartinên 14'ê Gulanê gef û êrîşên dagirkerên tirk û çeteyên girêdayî wê roj bi roj zêde dibin û êrîşên li ser rojane û qadên berxwedanê di vê çarçoveyê de têne meşandin. Ji neha ve xuyaye ku wê AKPê her tiştî bike ji bona ku di hilbijartinan de qezenc bike. Di serî de qadên berxwedanê, rojane bi çekên kîmyewî tê bombebaran kirin û şerekî giştî li ser her çar parçên kurdistanê tê meşandin. Êrîşên ku li ser firokxaneya silêmaniyê û yên ku rojane li ser rojava, şengal û pêlên girtin û binçavkirinê yên ku li bakurdê kurdistanê jî têne meşandin dewama van êrîşan e. Dagirkerên tirk û çeteyên wê bi hevkariya PDKê dixwazin ku destkeftiyên gelê kurd li rojavayê kurdistanê û hebûna tevgera azadiyê ji holê rakin. Ji bona vê yekê jî serî li hemû dek û dolaban dixin. Tecrîda li ser Rêber APO jî navenda van êrîşan e. Ji beriya êrîşên ku têne pilankirin Rêber APO dikin hedef û bi hincetên keyfî tecrîdê roj bi roj girantir dikin. Her weha qadên berxwedanê bê navber bi çekên qedexekirî tê bombarankirin. Li Rojava jî dagirkerên tirk û çeteyên wê bi hemû rêbazên gemar û qirêj, pêşengên tevgera azadî hedef digrin.

Wele din jî girêdayî rewşa sûriyê û aloziya ku tê jiyankirin, civînên çar alî jî yên ku qaşo bi navê çareseriya pirsgirêka sûriyê de têne çêkirin, raste rast rêveberiya bakur û rojhilatê sûriyê û destkeftiyên wê dike hedef û dixwazin wê ji holê rakin. Hikûmeta sûriyê jî her tim çavê wê ji derveye û bi danûsitandinên ku ji milê dewletên ereban ve têne meşandin, texmîn dike ku kêşeya sûriyê wê bi hesanî were çareserkirin. Ji ber vê yekê ji diyaloka sûrî – sûrî dûr disekine û hîn jî naxwaze rewşa heyî û guhertinên ku li sûriyê û heremê rûdane qebûl bike.

Heremên ku ji milê dagirkerên tirkiyê ve hatine dagirkirin jî rojane binpêkirin û kiryarên dij mirovî zêde dibin û ev yek jî li ber çavê cîhanê tevahî tê meşandin. Her çiqasî ku di nava saziyên navnetewî de Tirkiyê bi kiryarên xwe yên dijmirovî tê naskirin jî, lê heyanî îro ji bona vê yekê tu hewildanên ber bi çav ji bona dadgehkirina wê di dadgehên navnetewî de çênebûye. Ji bona hilbijartinên 14'ê Gulanê jî demeke kêm maye û qampaniya hilbijartinan bi coş û kelecaneke mezin bi rêve dimeşe. Partiya çepên kesk bi biloqa ked û aşîtiyê û bi sekna xwe ya xeta siyemîn hewildide ku di hilbijartinan de encamên baş bi dest xwe ve bîne. Ji bona serkeftinê jî bi roj û şev kar û xebatê dide meşandin û hêviyê gel bi wan mezin e. Her weha biloqa AKEPê û MHPê jî serî li hemû dek û dolapan dixin ji bona ku desthilatiya xwe biparêz e. Li gorî vê yekê pêwîste ku ji hemû milî ve amedekarî û hazirî baş werin kirin û li hemû parçên kurdistanê gelê kurd û dostên wan û hemû kesên azadî xwaz, xwe ji bona vê yekê hazir û amedebike. Ji ber ku encamê hilbijartinên 14'ê Gulanê wê bandora xwe raste rast li ser Bakurê kurdistanê û rojava û tevahî herêmê bike. Erkê me yê bingehî jî parastina destkeftiyên ku bi xwîna şehîdan hatine pêkanîn û azadiya fêzîkî ya Rêber APO ye.

---



### HILBIJARTINÊN TIRKIYÊ JI BO SÛRIYÊ JÎ PIR GIRING IN!

**DILYAR CIZÎRÎ**

Hilbijartinên Tirkiyê ku tên payîn 14'ê Gulanê werin lidarxistin nêz dibe. Ji ber destê Tirkiyê di aliyên leşkerî, civakî, aborî û siyasî di gelek welatên herêmê de heye, mijar wekî rojeveke sereke ya gelên Rojhilata Navîn ne jî. Raste di serî de ji bo gelên Bakurê Kurdistanê û Tirkiyê diyarkirina çarenûsê ye, ji bo gelê Sûriyayê jî di heman giringiyê de cih digre. Dewleta Tirk beşek mezin ji xaka Sûriyê dagirkiriye û piştgiriya komên tundrew ên li seranserî xaka Sûriyê şer dikin, dike. Di heman demê de bi milyonan welatiyên Sûriyê li ser xaka Tirkiyê koçber in. Ji bo civaka Tirkiyê êdî pirsgirêka koçberan mijareke sereke ye û pêwîste çareser bibe. Ev jî dibe sedema ev hilbijartin me ji nêz ve eleqedar bike. Bi taybet xelkên Bakur û Rojhilatê Sûriyê yên rojane rastî êrişên dewleta Tirk tên. Raste welatiyên Sûriyê nikarin dengê xwe bikar bînin, lê mijarê kêlî bi kêlî dişopînin û hêvî û daxwazên xwe tînin ziman. Ev gihiştiye asta êdî koçberên Sûriyê yên li ser xaka xwe di hindir de koçber bûne bi hêviya bi hilbijartinên Tirkiyê re rewş were guhertin û karibin vegerin malên xwe, demjimêran dijmêrin.

Ji bo wê jî her kes hêvî dike guhertina li Tirkiyê û hatina opozisyonê ya li ser dika desthiladariyê bibe zemîna guhertinên li Sûriyê, Iraq û gelek welatên Rojhilata Navîn. Hikûmeta AKP/MHP'ê bi hemû hêza xwe di hilbijartinan de kar dike, him di mijara perlemenê û him jî di mijara serokomariyê de li cihê xwe bimîne. Opozisyon jî li dijî Erdogan û hikûmeta wî tekoşînek mezin dike. Erdogan ji bo hilbijartinan qezenc bike, çend roj in li ser piya bû û hemû hêza dewletê xistiye xizmeta xwe.

Lê tişta balkêş Erdogan bi îdaya nexweşiyê nişkave nema beşdarî piropgandaya xwe ya hilbijartinê dibe. Di ragihandina Tirkiyê de wiha tê şîrovekirin, armanca Erdogan piştgiriya gel qezenc bike. Lê ya zêdetir tê ber aqilan, dewleta kûr a Tirkiyê ya Erdogan û hikûmeta wî bi rêve dibe, ji Erdogan re gotiye êdî em destê xwe ji te dikşîn in. Erdogan êdî gihiştiye wê baweriyê ew ê piştî 14'ê Gulanê derveyî serokatiyê be. Ji xwe Tîfaqa Ked û Azadiyê jî helwesta xwe aşkere kir. Ya din jî dibe ew di van rojan de amadekariya êrişeke mezin dike. Ji ber li gorî qanûnên Tirkiyê bi şer dikarin hilbijartinan paş de bixînin. Ji xwe heger şerek heye jî wê li dijî gelê kurd be. Ev dibe li Başûrê Kurdistanê li dijî gelê kurd û hêzên wan ên leşkerî be. Dibe jî li dijî Bakur û Rojhilatê Sûriyê be. Dibe telefona Erdogan bi Serokên Rûsiya Pûtin re jî di vê çarçoveyê de hatibe kirin. Ji ber wê jî pêwîste gelê me li Bakur û Rojhilatê Sûriyê ji van guhertinan baldar bin, di herdû Ihtîmalan de jî wê êrişên xwe yên li ser herêmê bi hemû hêza xwe bidomîne. Di heman demê de ji gelê Bakur û Rojhilatê Sûriyayê û berpirsên wê tê xwestin bi baldarî tevbigerin da xwe ji êrişan biparêzin.



# Dorpêça Şehbayê Sûcekî Dijmirovî Ye

Hikumeta Şamê careke din siyaseta dorpêçê bi awayekî girantir li ser herêma Şehbayê dide ferz kirin, her wiha Rêveberiya Xweser li Şehbayê da xuyakirin ku ger ev rewş dewam bike wê gel di zehmetiyên mezintir re derbas bibe.

**Zana Roj/ Qamişlo**

Hikumeta Şamê ji 5 salan ve siyaseta birçîbûnê li ser herêma Şehbayê yê ku bi hezaran koçberên Efrînê tê de bi cih bûne dide meşandin. Di van demên dawiyê de ev dorpêç bi awayekî girantir tê meşandin. Piştî erdheja ku di 6 Sibatê de hatiye rûdan bi hezaran gelê Helebê berê xwe dan Şehbayê, hikumeta Şamê ji bo nederbas kirina alîkariyê gelek siyasetên qirêj dan meşandin. Bi vî awayê dixwaze herêmê di hemû aliyan de tengav bike, da ku careke din herêmê bixe bin kontiorla xwe . Li hember vê yekê tavahî saziyên Rêveberiya Xweser daxuyanî ji bo bidawîanîna vê rewşê ji raya gîştî û rêxistinên navnetewî re dan ku ger li pêşiya vê yekê neyê girtin wê rewşa gel xirabtir bibe.



### Tûnebûna Madeyên sotemeniyê

Madeya sotemeniyê yek ji madeyên bingehîn yên civakê ye, li herêma Şehbayê ji bo derbaskirina madeyên sotemeniyê yên weke (mazot, xaz û benzîn) bi awayekî zehmet û baceyekî mezin bi riya Firqeya çaremîn re tê derbas kirin. Ev rewş ji 5 salan ve tê berdewamkirin, di van demên dawiyê de Hikumeta Şamê bi awayekî gîştî nahêle ku sotemenî derbasî herêmê bibe. Di encama vê yekê tavahî xebatên şeredariyê yên li herêmê wê bên rawestandin, her wiha eletrîka ku li gorî rewşa dawiyî 2 saetan dihat pêxistin, niha bi temamî hate qut kirin. Her wiha tevgera gel ya çûnûhatinê ji ber tunebûna sotemeniyê di herêmê de hatiye rawestandin.

### Bandora dorpêçê li ser gelê Efrîn

Li aliyê din di gîştî herêmê de 7 firneyên çêkirina nan hene, bê guman di rewşa heyî de bandoreke mezin li ser çêkirina nanê rojene hatiye kirin, bi taybet piştî derbasbûna gelê Helebê pêdiviya rojane ya nan zêdetir bû, her wiha rêveberiya herêmê ji bo pêkanîna pêwîstiyên gel bê navber xebatekî serkeftî dide meşandin. Di encama siyaseta dorpêçê û bandora wê de rewşa herêmê zehmetir dibe.

### Bandora dorpêçê li ser qada tenduristiyê

Di gîştî herêma Şehbayê de tenê nexweşxaneya Avrîn heye, ji destpêka bicihbûna koçberên Efrînê di herêmê de nexweşxaneya Avrîn li gorî kêmderfetan hate vekirin. Ev naxwaşxane ji bo alîkariya gel û ji nexweîiyên wê re bibe derman bê navber xebatekî gelek mezin dide meşandin. Di heman demê de nexwaşxaneya Avrîn ji rewşa ku tê jiyan kirin ne qut e, di aliyê kêmbûna derman de zehmetî tên kişandin, ji ber ku hikumeta Şamê nahêle derman û alavên tenduristiyl derbasî herêmê bibin. Her wiha nexweşiyên giran yên ku divê derbasî bajrê Helebê bibin, hikumeta Şamê gelek zehmetî û pirsgirêk derdixe.

Rewşa tenduristî rewşekî ku girêdayî pîvanên mirovahiyê ye, lê belê siyaseta qirêj ya hikumeta Şamê rewşa mirovî girêdayî siyaseta ku dixwaze bide meşandin dike.

### Armanc ji polîtîkeyên dij mirovî valakirina herême ye

Bi giştî rewşa dawiyê ya ku li herêma Şehba tê qewmandin rewşekî gelek zehmet û bi êş e. di aliyekî de êrîşên dewleta Tirk ya dagirker ji 5 salan ve nehatine rawestandin, di derheqê gelê herêmê de gelek komkûjî pêkanîn. Her wiha rojane herêm rastî topbaranan tê. Di aliyê din de hikumeta Şamê siyaseta herî qirêj ya pirçîbûnê bi awayekî herî giran dide meşandin, bi tengavkirina derbasbûna madeyên bingehîn yên jiyanê, tavahî polîtîkeyên dreveyî exlaqê bikar tîne.Yek ji armancên sereke ji van siyasetan ew e ku ewlekariya Rêveberiya Xweser tengav bikin û gel ji herêmê derbikeve.

### Gel di xeta berxwedaniyê de bi îsrar e

Koçberên Efrînê yên ku li ser xeta berxwedanî û têkoşîna bi hezaran ji Şehîdan dimeşin, ji 5 salan ve tu carî xwe radestî van siyasetan nekiriye û li hember dagirkeriyê bi hemû îradeya xwe berxwedaniyeke bê hempa dide rave kirin. Di van şert û mercên zehmet de jiyankirin, êdî ji tavahî cîhanê re dane îsbat kirin ku ne siyaseta qirkirinê û ne jî ya birçêbûnê dikare hêza wan bi bin bixîn e.

---

# Dîktator binkeftî, gel serkeftî

**Kakşar Oremar**

Hilbijartinên ku dikarin gelek tiştan biguherînin li bakurê Kurdistan û Tirkiyê. Ger rejîma diktalor a di bin pêşengiya AKP-MHPê de li Tirkiyê û bakurê Kurdustanê bi ser nekeve, ev serkeftin yê di rûpelên dîrokê de li ser navê Kurdan bê tomar kirin. Salên dirêje ku Erdogan bi kuştin û kiryarên antîdemokratîk re dijberiya doza Kurdan dike. Ew bash agehdarî dîroka Kurd û Kurdistanê ne. Baş dizanin ku di qada şer û siyasetê de êdî Kurd ne mirovên sed sal berê ne. Kurd bi kar û xebatên xwe gelek xewin û xeyalên xwendevanên xwendingehên Sefewîsim û Neu-Osmanîsimê vala derxistine.

Êdî em jî bêtir ji salên berê agehdarî rewşa xwe ne. Kurdistan dergûşa bajarvaniyeke kevnar a Rojhilata Navîn e. Gûherandin bingehîn û pêngavên mezin li welatê me têne avêtin. Serkeftinên vê carê li bakur û Tirkiyê tenê sûdê nagehînin doza Kurdên bakur, ewê li ser pêşkeftina Rojhilat, Rojava û Başûrê Kurdistanê jî xwedî bandoreke piralî be. Dayîka Kurdistana mezin di bin desthilata Tirkiyê de. Her serkeftina ku li wira hebe wê xwedî bandoreke erênî li ser gûherîn-vegûherînên perçên din jî be.

Li Rojhilatê Kurdistanê şoreşa Jin-Jiyan-Azadî ev rastiya zelal û dîrokî ji me re îspat kir ku sinorên siyasî-meinewî di nava Kurdan de neman e. Peyama vê şoreşa mezin ji bakur û girtîgehên Amedê ber bi Kobanê û îro jî ji Seqizê geha her dera Îran û rojhilatê Kurdistanê. Gelo gûherandin ji vê mezintir dikare cih bibe dema ku Îranî bi dengekî bilind diqîrin:" Kurdistan, Kurdistan, ronî û chavê Îran", " Kurdistan-Kurdistan goristana faşîstan".

Bi serhev de divê em ji van gûherandinên bingehîn vê rastiyê bizanibin ku biqasî hevgirtina dijminên dagirker hevgirtina Kurdan girîngtire jî. Ji ber ku dema her serkeftin û pêşkeftinek li pareke axa Kurdistanê chêdibe, xwedî bandoreke raste-rast li ser her sê parên din yên welatê me ye. Ji ber wê jî pir girîng û xaleke stratejîke ku Kurdên bakurê Kurdistanê girîngiya beşdarîkirina xwe di hilbijartinên 14' ê Gulanê de bizanibin. Ew serkeftin tenê a Amed, Wan an jî Rihayê nîne, belkî bêtir ji wê serkeftina Urmiye, Maku, Seqiz, Îlam, Kirmashan, Kerkûr, Efrîn û Enzabê ye jî. Dema li Îranê navenda şoreş û serhiladnên mezin rojhilataê Kurdistanê be, bi serkeftinên li bakurê Kurdistanê jiyana siyasî li Rojava û başur jî derbasî pêvajoyeke nûtir û bihêztir dibe. Her dengek weke tîreke kujere li dijî dijminê înkarger ku xeyalên Turanistanê dibîne. Heya niha Erdogan û Xaminyên bi rêya rijandina xwîn û îdama ciwanên Kurd xwedî serkeftinên formalîte û bê cewher bûne, lê êdî Kurdan ew sînor jî derbas kirine. şoreşa ku îro bi hemû germahiya xwe li Mehabad û Sine berdewame mukemilê wê şoreşê ye ku dehans ale li bakurê Kurdistanê bi xwîn û kedê gehaye destkeftên pir mezin.

Li vira daxwaza herî mezin ji partiyên siyasî li Kurdistana mezin ewe ku saniyek zûtir ji saniya din nêrîneke nûtir û hemdemî biser stratejîya xwe de bixishînin, Divê bang û dengê gel bêtir bê bihîstin. Chimkî pêshengên vê shireshê gel û hêza ciwanên Kurde. Cîhan bi pêşkeftinên hemû alî di qadên teknîk, ragehandin û mijarên din de sal ji sala beriya xwe ber bi biçûkbûnê ve diçe. Globalîsimê hemû tişt bihev ve girêdane û pêşkeftin û bandora kar û kiryarên ku rûdidin li ser hev heye. Ji van pêşkeftinên deh salên bihûrî Kurd li rûyê erdê xwedî serkeftinên mezin bûn e. Şikandina pirestîja DAIŞ ên hov ji Rojava dest pêkir, li Kobanê bi axê ve hate zeliqandin û li başûr jî Kurd xwedî rolekî mezin di serberjêrde çûyîna wê hêza hov bûn. Îro ew hêza modern û pêşverû li rojhilatê Kurdistanê pêşngiya şoreşeke homanîstî dike. Xala girîng di şikesta DAIŞê de ew bû ku AKP-MHPê li hemberî van serkeftinên Kurdan piştgîrî da DAIŞê. Bi qasî ku pêwîst be li ser vê rastiyê belge hene ku siyaseta gemar a Tirkiyê dide xûyanîkirin. Ev kiryar û helwestên dewleta Tirkiyê hinek rastiyên pişt perdê têda hene ku êdî bi zelalî ketine ber çavan. Bi wateyek din ew baş dizanin ku siyaseta Kurdan a demokratîk mehkûmî serkeftin û ber bi pêşveçûnê ye. Careke din weke serdema komara Kurdistan ku ji derfetên herî biçûk sûdekî mezin hatibû standin, dîsa jî dehan sal piştre Kurdan liyaqeta xweîdarekirinê ji hemû aliyan re dane selimandin. Ew pêngav bitaybetî li Rojavayê Kurdistanê pir serkeftî û pêre jî tirseke mezin xiste dilê rayedarên dewleta Tirkiyê a înkarger.

Siyaset dema weke zanistekê durist bê bikar anîn bê dê û bav nîne. Şer dema ku xwedî armancên pîroz be, dikare selefîzim jî weke Neo-nazîsimê bavêje goristana dîrokê. Di van her du qadan de êdî hêza pir alî a Kurd îspatkiriye ku tenê mehkûmî serkeftinê ye. Serkeftinên ku di xizmeta aştî û demokrasiyê de ne.

---

FENER



### Şam Li Benda Yên Li Şûna Erdogan E

**Idrîs HENAN**

Nakokiya berjewendiyan di têkbirina berhevdanên Rûsyayê ku bi lez û bez hewl dide têkîliyên navbera Enqerê û Şamê de asayî bike, rastî hinek derbên bloka hevalbendên rejîma Sûriyê hat û lingê insiyatîfa Rûsyayê ya ku dixwaze werîsê jiyanê bavêje hemtayê xwe Erdogan, seqet kir. Vê yekê rê li ber hinek nêzîkbûnên nû, taybet aliyê welatên ereb ve, vekir û carek din isbat kir ku çi civîna vîna li ser erdê esas nagire, ne gengaz e ser bikeve. Ji lew re; civînên berê û yên îro, platforma çaralî ya Rûsya, Şam, Tehran û Enqerê jî di nav be, nikarin teşeyekî rewa bar bikin ser xwe ku rikberiya rasteqîn a gelên Sûriyeyê paşguh kirine. Pêvajoya aloziya vî welatî carek din isbat dike ku hêza li ser erdê xwedî ezmûneke birêveberiyê ye, bi beşdarbûna maseyên çareseriyê re, wê goşe tablo, mozaîk û armancên civînan serguha bike.

Aliyek din ê gelek girîng heye ku baş diyar dike êdî doza Sûriyeyê veguheriye dozeke navneteweyî û gelek lîstikvanên dîtir ên bi hêz tê de hene. Ew aliyên mijara gotinê, xwedî hêzeke bandorker a li ser erdê ne ku çi mudexelekerên dîtir hebin, nikarin gav ser re bavêjin. Aliyên herî girîng jî Amerîka û Ewrûpa ne. Ew jî rê nadin hewldanên Rûsyayê yên li derveyî îradeya navneteweyî û ya hindirîn ku çareseriyeke li dijî biryarên navneteweyî yên fena -2254 – bi tena serê xwe peyda bike û tevî kirîza li Ukranyayê, xwe weke serkeftî nîşan bide.

Rûsyaya Pûtîn dixwaze vê platforma "Mosko, Tehran, Şam û Enqerê" bi çi awayî be bi ser bixe ku li dijî rikberê xwe Amerîka li Sûriyeyê xalekê bi dest bixe. Di heman wextê de dixwaze rola xwe weke hegemoniyeke global, ji nû ve, nîşan bide û sincên qitubûna heyî bişkîne û carek din bi hevalbendên xwe yên Urasyayê re, dinyayê dîzayîn bike. Faşîstê li qesrên Istenbûl û Enqerê rûniştiye, hewl dide, ji bo hemleya hilbijartinên 14'ê Gulanê sûdê ji vê rewşê werbigire û bi hevalbendên platforma nû re, koalisyoneke nû him li dijî hebûna hêzên hevpeymanê li rojhilatê Firatê ava bike û him jî projeya demokratîk li tevayî Bakurê Sûriyê di kesayeta pêşengiya Kurd de têk bibe û qirkirina nijadî dewam bike. Ev yek ji bona Erdoganê dîktator ku nikare bi rêbazên berê yên destwerdana rasterast armancên xwe bi cih bîne, rêya hîleyên nû yên hilbijartinan e ku bi êrişên domdar ên hindirîn re bi rola temamker radibin.

Ji xwe serokê rejîma Sûriyê, bi salan e li ser dubendî û nakokiyên aliyan dilîze û temenê desthilatdariya xwe aniye vê roja îro. Ji bona wî, semaya li ser nakokiya berjewendiyan ên hersê aliyan "Rûsya, Îran û Tirkiyê" rêbazekî xilasker ku sûdê ji marjînalbûna heyî werdigire da ku xwe weke serkeftî pêşkêş bike ku qaşo lîstikvanekî sereke di dosyaya Sûriyê de ye û kesek nikare wî derbas bike.

Lê xuyaye ku hewldana insiyatîfa lihevanîna Sûriyê û Tirkiyê rastî gelek sikendalên cidî hatiye. Rejîma Sûriyê baş têgihaştiye cewherê kirîza rejîma AKP-MHP û hewl dide vê yekê baş biçewsîne û şert û mercên xwe li ser ferz bike. Rayedarên dagirkeriya Tirk li kêleka têgihaştina wan ji vê yekê re, dizanin ku nikarin li derveyî Amerîka û Ewrûpayê ti lihevkirinên nû li ser axa Sûriyê feriz bikin û ne jî dikarin li ser erdê pêk bînin. Lew re; Erdogan wê nikaribe desteka li Sûriyê ji bo hilbijartinan lê digere werbigire û li bendê ye ku têk biçe. Her wiha diyare ku Şam jî li benda guhêrek û ên şûna wî ne ku lihevkirinên nû pê re îmze bike.